## Em remza têkoşîn û ronahiyê Roja Kobaniyê ya Cîhanî Pîroz dikin!

Em di salvegera 9'an de serfiraziya mirovahiyê ya li dijî tarîtiya DAIŞ'ê silav dikin.

Li Tirkiyeyê desthilat dixwaze bi rêya dadgehên ber destê xwe serfiraziya Kobaniyê ya ku têkoşîn û ronahiya hevpar a mirovahiyê ye tune bike. Em careke din soz didin hevalên xwe yên ku di doza Kobaniyê de tên darizandin, em ê têkoşînê mezin bikin.

Em dizanin ku êrişên ku îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên kirin dewama êrişên DAIŞ'ê ne. Desthilat dixwaze armanca DAIŞ'ê bibe serî. Li Rojava jiyaneke hevpar û demokratîk zîl dide û em ê bi gelên Rojava re piştevaniya xwe bidomînin.

Bi Berxwedana Kobaniyê piştgiriya enternasyonalîst a gelên cîhanê îroya me û siberoja me ronî dike. 1'ê Mijdarê Roja Kobaniyê ya Cîhanî di serî de li gelê Kurd û li temamê gelên bindest ên cîhanê pîroz be. #WorldKobaneDay

**Tulay Hatimogulları – Tuncer Bakirhan**
**Hevserokên Giştî yên HEDEP'ê**
**1 Mijdar 2023**